Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1004 | 12-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# Va Cûdî û vaye ev ax!

**Yavuz Akkuzu yê şanoger dibêje, ji bo slogana "Va Cûdî û va ye ev ax", ew ji talankirina xwezayê û her wiha ji dirûşmeya 'Va ne Kurd û va ne berhemên wan' tê. Peyaman wan jî pê "Em li vir in û karê xwe dikin. Em hunermend û şanoger berpirsyarên xwezaya xwe û zimanê xwe ne jî."**



Şanoya Bajêr a Amedê di navbera 20-30'yê Cotmehê de bi dirûşmeya "Va Cûdî û va ye ev ax!"* Mihrîcana Şanoyê ya 8´an li dar dixe. Mihrîcan li avahiya Şanoya Bajêr a li semta Dîclekentê ya navçeya Peyas a Amedê bi rê ve diçe.

**Lîstikvanê Şanoya Bajêr a Amedê Yavuz Akkuzu têkildarî mihrîcanê axivî.**

Şanoger Yavuz Akkuzu dibêje, îsal ew ê cara 8'an mihrîcana xwe li dar bixin. Ew bi bîr dixe ku gava qeyûm tayînî şaredariyê hatiye kirin, ew ji şaredariyê veqetiyane û wan bi xwe şanoya xwe ava kiriye. Yavuz Akkuzu di dewama axaftina xwe de got, "Li gorî min avakirina vê şanoyê helwêsteke gelekî mezin e, li dijî zextên
siyaseta Tirkiyeyê yên li şanoya Kurdî. Şanoyên taybet, ji aliyê aboriyê û ji aliyê naverokê ve
dikarin bi rehetî mihrîcanan li dar bixin. Gelê Kurd li dijî polîtîkayên desthilatê çawa disekine, em şanoger jî li dijî wan polîtîkayan disekinin. Ji bo me gelekî watedar e ku ji şanoyê heta perwerdehiyê, em her tişta xwe bi xwe dikin."

**'Va ne Kurd û va ne berhemên wan'**

Yavuz Akkuzu ji bo dirûşmeya "Va Cûdî û va ye ev ax!" a mihrîcanê jî got, "Ji talankirina xwezayê û her wiha ji dirûşmeya 'Va ne kurd û va ne berhemên wan' tê. Yanî em dibêjin, em li vir in û karê xwe dikin. Ev dirûşme divê tenê bi şanoyê ve neyê girêdan. Em hunermend û şanoger berpirsyarên xwezaya xwe û zimanê xwe ne jî. Her wiha hewce ye em berpirsyariya parastina mafên gelê Kurd jî bigirin ser milê xwe. Ji ber vê yekê, me ev dirûşme bi kar anî."

**'Trajediyê bi hunerî ji holê radikin'**

Yavuz Akkûzû di dawiya axaftina xwe de got, "Di van deman de li Sûrê, ji aliyê Wezareta Çandê ya Tirkiyeyê û Şaredariya Sûrê [qeypm dagir kiriye] ve mihrîcanek wê çêbe. Li gorî min, ev mihrîcan, qeyûman meşrû dike û çandeke wisa tîne ku Kurdan bibişivîne. Dixwazin trajediya di nava Sûrê de, bi huner ji holê rakin. Lê ew trajedî çi bi zimanê me, çi jî bi çîrokên me, divê kêm nebe. Bila gelê Kurd li dijî vê bişavtinê şanoya Kurdî bişopîne. 18 lîstik dê werin pêşkêşkirin û 12 ji wan dê cara ewilî li ser dika Şanoya Bajêr a Amedê bên lîstin.
Bila şanohez werin û lîstikên cûr bi cûr temaşe bikin."

**Ji Kerkûkê heta Ûrmiye û Ewrûpayê**

Şanoger Yavuz Akkuzu têkildarî naveroka mihrîcanê jî da zanîn ku ji Kerkûk, Dihok, Ûrmiye û Ewrûpayê, û ji gelek bajarên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê, lîstik hatine û got, di mihrîcanê de 18 lîstik wên bên lîstin. Wî da zanîn ku di mihrîcanê de semîner û kargeh jî wê bên lidarxistin.
Di mihrîcanê de, lîstikên bi navê "Hema Hema Jin Elîzabeth," "Tayo, Datdat û hin jiyanên beriya niha", "Qesra Balindeyên Xemgîn", "Bîrdank", "Serbaz", "Kas W Hanvin", "Morî", "Çîrokeke Cengê", "Tu Ne Gara Yî", "Banga Dawî", "Dansoz", "Dek û Dolabên Scapen", "Qabûza Merûyan", "Kûçikê Stalîn", "Jiyan ji te pir hez dikim", "Lîstik", "Serencama Qijikan" û "Haylo Dîsa Tevlihev Bû" tên lîstin. Her wiha kargeha "Derhêneriyê" û semînerên bi sernavên "Şano û dem" , "Girîngiya Şano û Şanonameya Kurdî" jî tên lidarxistin. Mihrîcan bi lîstika "Hema Hema Jin Elîzabeth" dest pê dike û bi lîstika "Haylo Dîsa Tevlihev Bû" bi dawî dibe.
*Ozgurpolitika*

# Rêxistinên Jîngehê: Ji ber êrişên Tirkiye jîngeha Herêma Kurdistanê xira dibe

**Berpirsên rêxistinên jîngehê diyar dikin sedema sereke ya xirabûna jîngeha Herêma Kurdistanê topbaran û birîna daristanan a ji aliyê dewleta Tirk ve tê kirine. Her wiha gotin, "Dewleta Tirk li dijî pîvanên mafên mirov û jîngehê ye û xwezaya Kurdistanê têk dide. Pêwîste hikûmeta Herêm û Iraq her wiha rêxistinên navnetewî li dijî van kiryarên dewleta Tirk helwest nîşandin."**

Zêdetirî du salin dewleta Tirk a dagirker ji Bakurê Kurdistan ta digihe nava xaka Başûrê Kurdistanê dest bi birîna daristanên Kurdistanê kiriye. Niha jî artêşa Tirk li herêma Zêbaryan bi hevkariya PDK'ê daran dibire û derbasî Tirkiyeyê dike.

**Derbarê mijarê de berpirsên rêxistinên jîngehê ji Rojnews re axivîn.**

Serokê Rêxistina Avyar a Jîngehê Aso Şikak îşaret bi kiryarên dewleta Tirk ên li ser xwezaya Kurdistanê kir û got: "Dewleta Tirk li dijî jîngeha




Herêma Kurdistanê ye. Têkdana jîngeha Herêma Kurdistanê ji aliyê Tirkiye û Îranê ve kiryarek dervey mirovahiyê ye. Ji berku bi sedan donim zevî û baxçe ji ber bombebaran û topbaranên van her du welatan şewitîne."
Aso Şikak da zanîn birîna daran a ji aliyê artêşa Tirk ve bandorê li ser jîngeha Kurdistanê kiriye û wiha domand: "Ji ber birîna daran, rêjeya şînkatiyê li xaka Herêma Kurdistanê gelek kêm bûye. Di heman demê de birîna daran bandorê li ser jîngeha cîhanê jî dike. Ji bona wê divê berpirsên Herêma Kurdistan, Iraq û Neteweyên Yekbûyî pêşî li binpêkirinên artêşa Tirkiye a li beramberî jîngeha Kurdistanê bigrin."
Li ser heman mijarê Berpirsê Rêxistina Dîdarî ya Jîngehê Mi-




hemed Sebah jî got, "Sedemê xirabûna jîngeha Herêma Kurdistanê artêşa Tirk a dagirkere. Birîna daran û têkdana jîngeha Herêma Kurdistanê ji aliyê artêşa Tirk ve li dijî hemû pîvanên navdewletî û jîngehê ne. Nabe bi ti awayek di dema şer de destdirêjî li ser jîngehê û birîna daran were kirin."
Her wiha Mihemed Sebah diyarkir têkdana jîngeha Herêmê û birîna daran ji aliyê dewleta Tirk ve dervey hemû yasayên jîngeh, mirovahî û şere. Mihemed got: "Deverên sinorî ji aliyê artêşa Tirk ve hatine têkdan û cihê jiyanê lê nemane. Daxwaz ji hikûmeta Herêma Kurdistan, Iraq û rêxistinên navneteweyî dikim li beramberî binpêkirinên dewleta Tirk bêdeng nebin."-
***ROJNEWS***

# Awûstralya dixwaze li Heyvê nebatan biçîne

**Zanyarên Awûstralyayî dixwazin ku heta sala 2025'an şînatiyan li Heyvê biçînin.**

Ji bo avakirina koloniyekê li Heyvê, hewila çandina şînatiyan tê dayîn. Lêkolînerên Awûstralyayî di daxuyaniya ku dan de wiha gotin: "Ev proje gava yekemîn e ji bo çandina şînatiyan li Heyvê da ku jê dexil û dan, derman û oksîjen bên hilberandin."
Biyologê şînatiyan yê Zanîngeha Teknolojiyê ya Queenslandê Brett Williams got ku wê tov bi wesayîteke fezayê ya Îsraîlê ya bi navê Beresheet 2'yê bibin Heyvê. Piştî daketina li Heyvê, wê tov di odeyeke girtî de bên avdan û wê zanyar lê binihêrin bê ka zîl didin ya na. Curên şînatiyan, li gor lezgînî û berxwedana xwe ya li dijî şertên hewayê yên derasayî bên hilbijar-



tin. Li gor profesorê Zanîngeha Neteweyî ya Awûstralyayê Caîtlîn Byrt, bi vê erkê hem destpêka jiyanê ya mirov li Heyvê tê avakirin hem jî dibe ku ji bo ewlehiya dexil û dan a germahiya kûreyî dibe sedem wek laboratûarekê bê bikaranîn.
Di daxuyaniya ji aliyê zanyaran ve hat dayîn de wiha hat gotin: "Eger em bikarin pergalekê ji bo çandina nebatan li Heyvê ava bikin, dibe ku em bikarin pergalekê ji bo peydekirina xwarinê li hin cihên herî zehmet ên li cîhanê ava bikin."

Ev proje, ji aliyê Organîzasyona Lûnarîa One ya ji zanyarên Awûstralyayî û Îsraîlî pêk tê ve, tê birêvebirin.
***-ANF***

Sudoku:Pirs 14

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 8 | | | 3 | 6 | 4 | | 5 |
| | | | | | | | | 6 |
| | 6 | 5 | | 1 | | | | 2 |
| 6 | | | 3 | | 1 | | | 9 |
| | | 7 | | | | 3 | | |
| 2 | | | 8 | | 4 | | | 7 |
| 5 | | | | 4 | | 1 | 2 | |
| 4 | | | | | | | | |
| 9 | | 3 | 2 | 6 | | | 7 | |

Sudoku: Bersiv 13

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 9 | 3 | 6 | 8 | 5 | 2 | 1 | 4 |
| 1 | 2 | 5 | 3 | 7 | 4 | 6 | 8 | 9 |
| 6 | 4 | 8 | 1 | 2 | 9 | 5 | 7 | 3 |
| 9 | 7 | 4 | 2 | 6 | 1 | 3 | 5 | 8 |
| 8 | 5 | 1 | 7 | 9 | 3 | 4 | 6 | 2 |
| 3 | 6 | 2 | 5 | 4 | 8 | 7 | 9 | 1 |
| 4 | 1 | 7 | 8 | 5 | 2 | 9 | 3 | 6 |
| 5 | 8 | 9 | 4 | 3 | 6 | 1 | 2 | 7 |
| 2 | 3 | 6 | 9 | 1 | 7 | 8 | 4 | 5 |




## 'Em ê xeyalên Hevrîn pêk bînin'

Jinên Partiya Sûriyeya Pêşerojê yên bajarê Minbicê, serbilindiya xwe bi helwêstên qehreman yên ku Hevrîn Xelef ji bo azadî û demokratîbûna Sûriyê nîşan dayîn, dan diyarkirin û gotin, Hevrîn ji bo her jineke azad û bi azwer bê navber kar û xebat dikir. ***R-2***

## Cemîl Bayik: PDK'ê kemîn vedabû

Cemîl Bayik got, balafirên keşfê yên dewleta Tirk nikarin li Balîsanê gerîlaya tespît bikin lê, çekdarên PDK'ê
dikare wan tespît bikin û agahiyê bidin! ***R-3***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1004 | 12-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# HÊRSA GEL YA LI DIJÎ KOMPLOYÊ GIHIŞTE LÛTKEYÊ

Ji bo şermezarkirina Kompoloya Navneteweyî ya li dijî Rêber Abdulah Ocalan ku beriya 24 salan dest pê kiriye, welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê daketin qadan. ***R-3***



## Kalkan: PKK hêza çareseriyê ye



Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Dûran Kalkan got, PKK li hemberî neçareseriya sîstema modernîteya kapîtalîst, bi xeta Neteweya Demokratîk xwe kiriye hêza çareseriyê. ***R-4***

## `Armanca komplo bi tîkoşînê têk diçe`

Gulîstan Oso kompoloya 9'ê Cotmehê ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û diyar kir ku, komplo ne li ser Rêber Ocelan tenê ye, li dijî tevahî gelê Kurd e. Herwiha bang li gelê herêmê bi taybetî gelê Kurd kir ku, dijî komployê, têkoşîna xwe xurttir bikin û ji bo azaiya Rêber Ocalan li ser piya bin. ***R-5***

## KCK'ê şehîdên 10'ê Cotmehê bibîr anî

KCK: Emê xwedî li bîranînên hemû şehîdên şoreş û demokrasiyê derkevin û têkoşîna wan bigihînin serkeftinê. ***R-3***

## `Kampaniya Gel` hewl dide çandiniyê li herêmê pêş bixe





Bi armanca pêşxistina çandiniyê û kalîteya tovan `kampaniya Gel` kar û xebat dike. Herwiha hewl dide ku rêjeyeke baş ji tovan, ji bo gelê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê peyda bike. ***R-6***


## Rêxistina Mafê Mirovan: Ji serê salê ve 428 kes li Îranê hatine darvekirin



Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê di roja parastina cezayê darvekirinê de ragihand ku di destpêka sala 2022'yan heta niha li Îranê rêjeya kesên hatine darvekirin, li gorî sala borî sedan 89 zêde kiriye û hat eşkerekirin: "Di nava vê demê de 2 zarok û 12 jin cezayê darvekirinê lêhatine birîn." ***R-4***



Şariştan Nurhak
Bi Kuştina Jîna Emînî Re Dîwarên Kuştinê Hilweşiyan R-2



Farûk Sakik
Komplo û Komploger R-4

Zekî Bedran
Rêya çareserîyê mayînde demokrasî ye R-5

# ‘Em ê xeyalên Hevrîn pêk bînin’

Jinên Partiya Sûriyeya Pêşerojê yên bajarê Minbicê, serbilindiya xwe bi helwêstên qehreman yên ku Hevrîn Xelef ji bo azadî û demokratîbûna Sûriyê nîşan dayîn, dan diyarkirin û gotin, Hevrîn ji bo her jineke azad û bi azwer bê navber kar û xebat dikir.

**Navenda Nûçeyan / Minbic**

Piştî ku şoreşa Rojava sazî û dezgehên xwe ava dike, Hevrîn dibe rêvebera Meclisa Aborî ya bajarê Qamişlo. 21`ê Kanûna 2014’an dema Rêveberiya Xweser tê ragihandin û saziyên rêveberiyê jî tên avakirin, Hevrîn wek Cîgira Desteya Enerjiyê, cihê xwe di rêveberiya Kantona Cizîrê de digire. Piştî 2015’an jî wek Hevseroka Desteya Aborî ya Cizîrê tê hilbijartin.

Piştî ewqas kar û xebat 27’ê Adara 2018’an, Hevrîn li bajarê Reqayê li Kongreya damezrîner ya Partiya Sûriya Paşrojê, amade dibe. Ji ber ku Hevrîn bi çalakiya xwe ya pêşxistin û parastina mafan dihat naskirin, di kongreya damezrîner de dibe Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Paşrojê.

12’ê Cotmeha 2019`an, dema ku Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Paşrojê Hevrîn Xelef bi erebeya xwe li ser riya m4 ya bajarê Qamişlo diçe, çeteyên DAIŞ’ê yên girêdayî Tirkiyê, rê lê digirin û bi awayekî hovane wê şehîd dixin.

Ji ber ku jin, civakê bi rêve dibe û di tekoşîna xwe ya azadiyê gihîştiye asta herî jor, Dewleta tirkî ya dagîrker û hemû hêzên wek wê ku bi desthilata zilamê serdest tên birêvebirin, di her aliyê jiyanê de jinan dikin amanc. Ji bo wê jî di her êrişê de despêkê, berê xwe didin jinan. Herwiha bi kuştin û revandina jinan, dixwazin civakê bişkînin û tirsê bixin nava gel. Heta niha jî jinan dikin hedef û hewl didin jinên pêşeng, wek Hevrîn Xelef, Zeyneb Saroxan, Jîna Emînê, yadê Eqîde, Barîn, Evêsta, Nugîhan Akarsel û gelek jinê din jî, tine bikin.

Bi boneya salvegera 3`yan ji şehadeta Hevrîn Xelef jinên Partiya Sûriya Paşerojê ji me re axivîn û dan zanîn ku, Hevrîn ne ji bo gelê Kurd tenê, ji bo azadiya tevayiya gelên Sûriyê dixebitî.

**`Tirkiyê û hevkarên wê ji ramanên Hevrîn ditirsiyan`**

Endama Meclisa Giştî ya Partiya Sûriyeya Paşerojê Hind Daxistanî, da zanîn ku Şehîd Hevrîn di gelek xebatan de cih girt û axaftina xwe wiha domand: “Ji ber ku Hevrîn gelek kar û xebatên siyasî û civakî daye meşandin û di Partiya Sûriya Paşrojê de jî bê navber dixebitî û dixwest ku Sûriyeke azad û demokrat ava bike, dijmin ew kir armanca xwe. Ji bo wê jî Hevrîn ji aliyê çeteyên dewleta tirkî ve bi awayekî hovane hat şehîdxistin.




Dewleta Tirk û kesên girêdayî wê pir ji fikir û ramanên wê ditirsiyan, lewra Hevrîn heta niha sax bûya wê gelek guhertinên din bi xwe çêkiriba.”

**`Xwedî hêzeke mezin û îradeyeke xurt bû`**

Hind di berdewamiya axaftina xwe de bîr xist ku kesayeta Hevrîn bû bingeha hêz û îradeya tevayiya jinan û wiha got: “Hevrîn roleke pir girîng û bibandor di çareserkirina krîza Sûriyê de û xebata ji bo bidestxistina aştiyê, lîst. Ew jineke xwedî hêzeke têr û îradeyeke xurt bû ku karîbû karê siyasî û rêxistinkirina jinan bi rêve bibe. Herwiha bi sekn û îradeya xwe ya xurt hewl da adet û kevneşopiyên civakê, yên lawazkirina jinê biguherîne.”

Endama Meclisa Giştî ya Partiya Sûriyeya Paşerojê Hind Daxistanî di dawiya axaftina xwe de got, di sala 3`yan ji bîranîna Hevrîn Xelef de, wek jinên bakur û rojhilatê Sûriyê emê xwestek û xeyalên wê yên avakirina Sûriyeke democrat, pêk bînin. Da ku Yasemîna Sûriyê bibe aştiya gelan û ti cudayî di navbera ti kesî de nemîne. Lewra em tev yên vê xakê ne.

**`Deng û nûnera jina azad bû`**


Seroka Bîroya Rêxistina Partiya Sûriya Pêşerojê ya Meclîsa Minbicê Asya El Hisên jî wiha got: “Armanc ji şehîdxisina Hevrîn Xelef, şkandina vîna jinan bû. Mirov dikare bêje bûyereke di çarçoveya plansaziya kuştina jinan de bû. Lewra şehîd Hevrîn deng û nûnera jina azad bû. Ji ber vê yekê dijmin xwestin di şexsê Hevrîn, tirsê bixin dilê jinên xwedî hêz de.”

Asya destnîşan kir ku Hezkirineke hevbeş di navbera şehîd Hevrîn û gel de hebû, lewra daxwaza wê ya sereke aştî û çareserkirina krîza Sûriyê bû û got, bila her kes bizane ku armanca çetayan ji şehîdxistina Hevrîn pêk nehat, lewra rojbiroj jin di qada siyasî û partiyên siyasî de bi awayekî berfirehtir pêş dikevin.

**`Kesayeteke ku mirov ti caran ji bîr nake bû`**

Seroka Bîroya Rêxistina Partiya Sûriya ya Pêşerojê ya li Meclîsa Minbicê Asya El Hisên di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Em çi bikin emê nikaribin heqê kesayetek siyasî mîna şehîda Hevrîn Xelef, bidin. Kesayeteke ku mirov ti carî nikare ji bîr bike bû.”

## Bi Kuştina Jîna Emînî Re Dîwarên Kuştinê Hilweşiyan



**Şarîstan Nurhak**

**Ev car, pêşengên heqîqeta “JIN JIYAN AZADÎ” jinên APOyî dikin û bi serfirazî vê heqîqetê diyarî tevahî jinan û mirovahiyê dikin. Ev ji bo her jineke Kurd, ger ne cihê şanaziyê ye, wê demê çiye!**

Di nav rastiya pergala serdest de mirovahî û bi taybetî jin di her kêliya jiyanê de bi hişmendî û feraseta kujer re rûberû ne. Lê, di dîrokê de heya roja îro rastiyek heye ku tu carî nehîştiye kuştin bi serbikeve. Ew rastî, rastiya “JIN JIYAN AZADÎ” ye. Her çiqas ev rastî ji aliyê bi hezaran pergalên hikûmdar, zordest û dagirkeran ve hatibe asteng kirin jî, lê tu caran wan bi hemû hêza xwe jî nekariya destwerdanê li koka heqîqeta “JIYAN JIYAN AZADÎ” bikin. Herikîna dîroka mirovahiyê ya ku tim zaniye xwe di malzaroka jindayîk de biparêze, di vê sadsalê de carekî din vê rastiyê radixe pêşberî me. Ji lewra ger em bêjin; di ev sedsala em dijîn de, jin kêlî bi kêlî azadiyê lê dineqişînin û ev jî wê ji tekoşîna jinan re bibe bersivekî herî rastteqîn û mafdar. Ev car, pêşengên heqîqeta “JIN JIYAN AZADÎ” jinên APOyî dikin û bi serfirazî vê heqîqetê diyarî tevahî jinan û mirovahiyê dikin. Ev ji bo her jineke Kurd, ger ne cihê şanaziyê ye, wê demê çiye! Em bi vê şanaziyê dakevin nav kûrahiya ruhê serhildêr yê ku êdî di cîhana her jinekê de serî hildaye. Bazdana ber bi cîhana her jinekê, tê wateya bazdana ber bi Jiyana Azad.

Çawa ku her pirsgirêka mirovahiyê dema tê vekolandin, zihniyeta mêr-dewletê û pergala desthilatdar ya afirandiye derdikeve pêşiya me, rastiya kuştinê jî bi heman şêwayî xwe dispêre koka vê zihniyetê. Ger em bêjin rastiya kuştinê di kêlî û serdema ku zilam di xwe de jiyan kuşt de, kuştina jinê jî dest pê kir, wê cihê xwe bigre. Hişmendî û çanda bi pêşengiya zilam ava bû, li cihê jiyanê kuştin, li cihê azadiyê koletî, li cihê hebûnê tinebûn û li cihê jin û jiyanê zilamtiya jinkujiyê afirand. Ev jî, xwe dispêre dîrok û çandekî hezar salî. Ji ber wê em dikarin bêjin ku ev rastî di heqîqet û dîroka mirovahiyê de rastiya herî xedar û herî metirsîdar e. Pergala mêr, xwe li ser kuştina jiyanê ava kiriye. Lê mirovatiyê jiyana xwe bi heyîna civakbûyîna jinê bi hebûn kir û heya roja îro kariye hebûna xwe biparêze. Bi zihniyet, ruh, îrade, bawerî, hêvî, heskirin, xweşbînî û bi hezaran cêwiyên wekî vê têgeh-peyîvê di nav ahenga gerdûnê de jiyana xwe domand û bi hemû zindiyan re fêrkeriya jiyanê parve kir. Lê êdî, mirina ku di oxira jiyanê de wekî parçeyekî hebûnê di jiyana mirovan de pîroz lê dihat nêrandin, veguheriye kuştinekî xedar ya rûmet, pîrozî û hemû nirxan. Pergala desthilatdar û zihniyeta mêr-dewletê, hezar û yek mifte li qifla vê têgeh-peyîvê daye. Di civaka zayendperest de ev mifte wekî çekekî, ya domandina jiyanê lê hatiye. Dema ku zihniyet, kor, ker û lal bibe dikare di nav her çerxê de werê gerandin, bê ku zanibe rêya xwe bibîne û bi ser xwe ve werê. Pergala mêr-dewletê ev çerx li ser civaka mirovahiyê û bi taybet jinan gerandiye û bi sedsala ye ev çerx digere.

Jina Kurd Jîna Emînî, di vê çerxê de ne qurbana dawî û ne jî ya destpêkê bû. Lê ew bû ava ku êdî di ser îskanê re birije xwerê. Kuştina Jîna Emînî, hafîzeya kuştina hemû jinan û mirovahiyê zindî kir. Ji lewra hêrsa ji ber kuştina Jîna Emînî bilind bû, ne hêrsekî rasthatî û ji xwe ber bû. Her civakek dema ku pê hesiya êdî sînorê êrîşan xwe nêzî hinav û cergên wan dike, wekî volkanekê bi serê pergalên serdest de diteqe û dibe topek ji agir. Zihniyet û pergala mêr ya ku rêya xwe di kuştina jinan de dibînê, dikare heta demek an jî pêvajoyekî bibe xwedî şans. Lê civakbûyîn her tim dikare rêya xwe bibîne, rêya xwe veke, biguherê û bide guhertin. Ji ber ku tu hêz di ser hêza civakê re nîne ku xwe wekî rastiyekî mutlaq ya di vê cîhanê de bide jiyankirin. Dema ku civakbûyîn bi jina îrade bûyî hêza xwe bide axaftin, tu desthilatdar û pergalên serdest nikarin hebûna xwe li ber vê rastiyê bidomînin. Li Rojhilatê Kurdistanê-Îranê raperîna jinan ya ku di 15 rojan de tevahî dîwarên pergala netew-dewlet ji binîve hejandin, divê em jî vê hêza mezin ya jin û gelan ku wekî hişmetê, bi ser pergala mêr-dewletê ve diçe bibînin û rast bixwînin. Dem ew dem e ku hemû jin vê raperînê wekî raperîna xwe bibînin, xwedî lê derbikevin û dîwarên kuştinê yên di mêjî û dil de hatine lêkirin hilweşîne. Ger jin di cîhana xwe de raperîn û di dilê xwe de Azadiyê bike sedema hebûn û heyîna xwe, dikare li hemherî tevahî pergalan bê weswes serî hildin, li ber xwe bidin û felsefeya “JIN JIYAN AZADÎ” wekî tovekî ruh bide zindiyên gerdûnê.

Êdî jinên ku di cîhana xwe de raperîn û di dilê xwe de eşqa azadiyê kamil kiribe tu hêz nikare li hemberî serî rakirina wan bisekine, ger bisekinê jî dawiya dawî de ew mahkûmî binketinê ye.



# Festîvala Şanoyê ya Amedê dê bi silavkirina Cûdî dest pê bike

8’emîn Festîvala Şanoyê ya Amedê ku ji aliyê Şanoya Bajêr a Amedê ve tê lidarxistin, di roja 20’ê Cotmehê de dest pê dike. Lîstikvana şanoyê Berfîn Emektar da zanîn ku dê di festîvalê de 15 ji wan bi Kurdî 18 lîstik bên pêşkêşkirin.

Festîvala Şanoyê ya Amedê ku îsal cara 8’emîn dê bê lidarxistin dest pê dike. Festîvala şanoyê ya ku ji aliyê Şanoya Bajêr a Amedê ve tê lidarxistin dê di navbera 20-30’ê Cotmehê de bê lidarxistin. Festîvala ku salên borî ji ber pandemiyê nehat lidarxistin, îsal bi dirûşma “Wayê Cûdî û wayê ev ax!” a helbesta Arjen Arî bê lidarxistin. Wê di festîvalê de 15 ji wan bi Kurdî 18 lîstik bên pêşkêşkirin.

Yek ji lîstikvana Şanoya Bajêr a Amedê Berfîn Emektar a ku em der bare festîvalê de pê re axivîn, diyar kir ku divê gel li şûna festîvalên ku bi armanca asîmîlasyonê tên lidarxistin, beşdarî festîvala şanoyê ku dê di 20’ê Cotmehê de dest pê bike bibe.



**Di festîvalê de dê gelek lîstikên sezona nû cih bigrin**

Berfîn Emektar, anî ziman ku ew festîvalên beriya qeyûm bên tayînkirin di şaredariyê de dest pê kirin weke şanoya bajêr berdewam dikin û diyar kir ji derveyî pandemiyê tu carî navber nedane xebatên xwe û festîvalê ku tên lidarxistin. Berfîn Emektar diyar kir ku festîvala dê îsal li dar bixin ji bo wan gelek xweş derbas bibe û ragihand ku dê gelek şanoyên Kurdî di festîvalê de bên pêşkêşkirin.

**“Me xwest em bi dirûşma xwe silav bidin çiyayê Cûdî”**

Berfîn Emektar da zanîn ku lîstik dê temaşevanan jî kêfxweş bike û diyar kir ku bi dirûşma “Wayê Cûdî û wayê ev ax” jî armanc dikin silav bidin Çiyayê Cûdî yê ku tê wêrankirin. Berfîn Emektar di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Ji Dihokê lîstikek me heye, dîsa ji Kerkûk, Stenbol, Wan, Êlih û Belçîkayê lîstik hene.

Di festîvalê de hebûna gelek lîstikên nû ji bo me jî cihê kêfxweşiyê ye. Me xwest îsal festîvalê bi dirûşma ‘Wayê Cûdî wayê ev ax’ li dar bixin. Çima, ji ber ku ev çend salên dawî qetlîamek pir giran li wê derverê tê jiyîn. Ev komkujî ji çandê dest pê dike û heta xwezayê diçe.

Talanek pir cidî heye.

Ji ber vê me îsal ev dirûşm ji bo festîvalê hilbijart. Dar û xweza tenê tiştên sembol nîn in, xweza ji bo me her tişt e. Dar tenê bi serê xwe ne darek e, çand, ax û huner e. Ji ber vê me xwest bi 8’emîn Festîvala Amedê re em silavek bidin Cûdî.”

**“Bila Kurd beşdarî festîvalên Ku çanda wan nîşan didin bibin”**

Berfîn Emektar diyar kir ku li şûna festîvalên ku bi armanca asîmîlasyonê tên lidarxistin divê gel beşdarî festîvalên şanoyê ku çand û zimanê nîşan dide bibin û wiha axivî: “Em dixwazin gelê me tevlî festîvalê bibe û xwedî lê derbikeve. Gelek festîvalên ku xîtabê çand û zimanê me nakin, îro li Amedê bi destên qayûman tên lidarxistin. Di hundirê vî de ne çanda me û ne jî zimanê me cih nagire.

Bi vê yekê re dixwazin asîmîlasyonê bi pêş bixin. Ji ber vê em ji festîvala şanoyê re tevlibûnek mezin dixwazin. Festîvala me li dijî van karan alternatîfek e. Festîvalek ku ziman û çanda me nîşan dide ye. Ji ber vê yekê em hemû kesan vedixwînin vê festîvalê.”

***JINHA***

# Xelatên Wêjeyê yên Huseyîn Çelebî hatin dayîn

**Xelatên Wêjeyê yên Huseyîn Çelebî ya 29’emîn îsal li Stûttgart Festhalle ya li Stûttgart Feûebachê hat dayîn.**

JXK û YXK’ê ji bo bibîranîna Şehîd Huseyîn Çelebî, 29’emîn Pêşbirka Wêjeya ya Huseyîn Çelebî di saet 14.00’an de li Stûttgart Festhalle ya li Stûttgart Feûebachê li dar xist. Ji Ewropa, Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê gelek çîrokên kurt û helbest hatin şandin. Tevlêbûna herî zêdê ji girtîgehên Elmanyayê û Tirkiyeyê çêbû.

Çîrokên Kurdî ji aliyê Loqman Guldivê; helbest Fevzî Ozmen, Abdûlkadîr Ûlûmaskan û Aysel Avesta; çîrokên Tirkî Orhan Çelîk



û Bayram Balci; çîrokên Tirkî Hicrî Îzgoren, Sercan Aydin û Robert Pekgoz; metnên Elmanî jî ji aliyê Anja Flach, Ceren Yildirim û Newroz Botan ve hatin nirxandin.

Eywana merasîmê bi pankartên ku gotinên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên “Wê şoreş bibe azadiya jinê” û “Ên dîroka xwe ya azadiyê rast nenivîsin, nikarin azad bijîn” li ser hatin hatibûn nivîsîn, hat xemilandin. Pankarta ku gotina Huseyîn Çelebî ya “Ez bawer nakim ku gelek ku êşên herî kûr jiyabe, kefxweşiyên herî zindî hîs bike” li ser hatibû nivîsîn û ji bo bibîranîna Şehîd Sara Goyî û Şehîd Rûken Zelal pankartên li ser “Xwedawendên Azadiyê” hatibû nivîsîn, hatin daliqandin. Bi berzkirina dirûşmeya “Şehîdên me rûmeta me ne” Şehîd Zekiye Alkan, Şehîd Huseyîn Çelebî, Şehîd Rahşan Demîrel, Şehîd Dîdar Harûn û Şehîd Firat Çîçek hatin bibîranîn.

Merasîm di şexsê Huseyîn Çelebî de ji bo bibîranîna hemû şehîdan bi deqeyek rêzgirtinê dest pê kir. Piştre Kamo Çelîk li ser navê YXK û JXK’ê axivî. Çelîk diyar kir ku îro ew bi navê wî, li têkoşînê dewam dikin û got: “Îro jî em weke ciwanên Kurd, ji bo bibîranîna Huseyîn Çelebî xwe bi rêxistin dikin. Merasîma me ya wêjeyê, ji sala 1993’yan heta bi niha tê lidarxistin. Em dixwazin ku ji berhemên ji Kurdistanê dişînin bo Ewropayê re bibêjin ku hûn bi xêr hatin û helbestên ku xelat wergirtin bixwînin û kesên hêjayê kar kirinê ne bibînin.”

Bavê Huseyîn Çelebî, Rifat Çelebî jî bi çepikan derket ser dikê û silav li kesên li salonê kir. Çelebî diyar kir ku ew li jiyana xwe ya ku li Kurdistanê bi sirgûnê dest pê kiriye îro li Ewropayê bi sirgûnê dewam dikin û wiha got: “Em hêj zarok bûn, hînê welatparêziyê bûn. Hêj Huseyîn 7 salî bû ez û wî tev li çalakiyeke li dijî şer bûn. Huseyîn ji hingê ve ji tu tiştekî nema. Gava ketibû zindanê êşkence lê kiribûn. Hestiyên lingên wî şikestibûn, lê wî rojek jî dev jê berneda.“

Piştî stranên Rêber Serhad û Cemîl Qoçgîrî, sînevîzyonek li ser jiyana Huseyîn Çelebî hat nîşandan. Piştre yên di beşê helbest û çîrokê de pêşbirk kar kirin, hatin eşkerekirin û xelat hatin dayîn. Herî dawî Sûna Alan diyar kir ku ew stranên xwe dike diyarî ji bo hemû jinên niha li ber xwe didin.

Yên Xelatên Helbest û Çîrokan a Huseyîn Çelebî ya 29’emîn girtin ev in:

**HELBESTÊN BI KURDÎ:**

Îşev - Devrîm Arjîn Welat; Girtîgeha Jinan a Sîncanê
Arînên li her derê - Alattîn Befre
Bilindiya Ezmanê Baweriyê - Mûstafa Karaboga



**ÇÎROKÊN BI KURDÎ:**

Bi navê Evinê - Yilmaz Tekîn
Tûrikê Pîrê - Mesût Yûrtsever; Girtîgeha F ya Bolûyê Û Tûrike Zimanan - Hisên Çatikkaş
Bêhna Miriyan - Roger Sozdar

**HELBESTÊN BI ELMANÎ:**

“Der rote Schein am Horizont” – Agir
“Ein nefes Bild” - Rojbîn Serhat
“Hast du gelernt zu lieben “ - Naomîe K.

**ÇÎROKÊN BI ELMANÎ:**

“Metamorphosen” - Zozan Dilbirîn
“Die Fahrt meines Lebens” - Zozan Dilbirîn
“Kurzgeschichte” - Anonim

**HELBESTÊN BI TIRKÎ:**

Ezidi bir kız çocuğu ve lal tanrılar - Kerem Çîftcî
Korkulur Yağmurun Böylesinden - Alaz Derweş
İkilem İklimi - Nûriye

**ÇÎROKÊN BI TIRKÎ:**

Lapîs lazûlî – Sîbel Mustafaoglû/ Girtîgeha Jinan a Şakran a Îzmîrê
Cep Aynasi – Eylem Kahraman/ Elmanya
Cemilenin Ruyasi – Nergîz Necla

***-ANF***

# `Kampaniya Gel` hewl dide çandiniyê li herêmê pêş bixe

Darîn Silê/Qamişlo

**Bi armanca pêşxistina çandiniyê û kalîteya tovan `kampaniya Gel` kar û xebat dike. Herwiha hewl dide ku rêjeyeke baş ji tovan, ji bo gelê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê peyda bike.**

Ji ber ku çandinî çavkaniya û jêdera sereke ya xelkên Sûriyê ye, debara jiyanê li Sûriyê bi çandiniyê ve girêdayî ye. Bi taybet li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, dema çandinî lawaz dibe, Aboriya herêmê jî lawaz dibe. Di van çend salên dawî de krîza Sûriyê bandoreke mezin li ser çandiniyê kir. Bi taybet êrişên dagirkeriya Tirkê li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herwiha qutkirina ava çemê Firatê, hedefgirtina kanalên avdanê û bircên Elektirîkê, bûye sedema kêmbûna zeviyên çandiniyê û kêmbûna hilberîna çandiniyê bi giştî.

**Hewldanên Rêveberiya Xweser yên pêşxistina çandiniyê**

Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê tevî êrişên hovane yên dewleta tirkî ya dagîrker Rêveberiya Xweser her sal piştgiriyê dide cotkaran, ji ber wê jî pêşketineke berçav di milê çandiniyê de tê dîtin. Herwiha rêveberî, bi tevayiya derfetên heyî hewl dide çandiniya li herêmê pêş bixe. Ji bilî alîkariya çotkaran, bi armanca pêşxistina çandiniyê, hin komeleyên çandiniyê û kampaniyayên taybet ava kir.

**`Kampaniya Gel` Yek ji kampaniyên pêşxistina çandiniya li herêmê ye**

Yek ji kampaniyên çandiniyê yên pêşxistina sektora çandiniyê, `Kompaniya Gel` ya ku bi serpereştiya Rêveberiya Xweser ji aliyê sê pisporên çandiniyê ve, di Tebaxa 2021`ê de li bajarê Qamişlo hat avakirin û şaxeke wê jî li bajarê Dêrikê heye. Ev Kampaniya hewl dide çandiniyê di warê zêdekirina hilberînê û başkirina cureyên tovên çandiniyê, li bakur û rojhilatê Sûriyê pêş bixe.
Di kampaniyayê de 140 karkerên jin û mêr, 10 endazyar û 3 pisporên çandiniyê, di herdu şaxên kompanyayê li Qamişlo û Dêrikê hatine dabeşkirin, kar dikin. Karê wan di saet 8'ê sibehê de dest pê dike û di 5'ê êvarê de bi dawî dibe. Rêjeya jinên di kampaniyê de jî dixebitin sedê 50 ye.

Rêveberiya Xweser 14 hezar donim zeviyên çandiniyê, radestî kampanyiayê kir, 12 hezar donim li bajarê Dêrîk û 2 hezar jî li Qamişlo radest kir. Da ku zeviyên kampaniya tê de bên çandin û di dawiya her salê de, hilberîna berhemên çandiniyê bê pere radestî Rêveberiya Xweser bê kirin. Bi vî awayî, dê tov û berhemên çandiniyê li bakur û rojhilatê Sûriyê were peydekirin û pêşxistin.



**Cûreyên çandiniyê**

Cûreyên çandiniyê yên ku ji hêla kampaniya ve tên çandin jî ev in: Gula berberû, Fûlê soya, genim, garis û pembû.

**`Şopandina zeviyên çandiniyê ji hêla endezyaran`**

Derbarê kar û xebatên `Kampaniya Gel` endezyara çandiniyê Ahîn Xelîl ji me re axivî û got, Her sibehê endezyarên li kampanioyayê diçin nava zeviyan, da ku berhemên çandiniyê kontrol bikin. Ji bilî wê jî dirêjahiya zeviyan dişopînin û dinêrin ka pêwîstiya çandiniyê bi avdanê heye an na. Herwiha endezyar ax û zeviyan jî kontrol dikin.

**`Çandina tovên Folê Soya serkeftî bû`**

Ahîn da zanîn ku çandina Folê Soya ji aliyê wan ve weke ezmûneke destpêkî bû, ji bo rêjeya serkeftina çandiniya, wê li herêmê nas bikin û axaftina xwe wiha domand: "Rêjeya çandiniya Folê Soya li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kêm bû. Ji ber wê jî me xwest em ezmûnek despêkî li ser çêkin. Niha bi çandiniya wê hat dîtin ku rêjeya serkeftina wê, li herêma me pir mezin e."

**`Çêkirina ezmûnan û naskirina cûreyên tovan`**

Ahîn da zanîn ku Kampaniya ezmûnan li ser tovan çêdike û



wiha dirêjî da axaftina xwe: "Me beşek ji zeviyan ji bo ezmûnan veqetandiye. Ev beş, têde tevayiya çûreyên tovan tên çandin û ezmûnkirin. Da ku em cûreyên herî serkeftî li herêmê nas bikin. Îsal 400 cureyên genim û 12 yên pembo hatin çandin. Herwiha tevayiya zeviyên ku tên çandin jî bi rêya spartekan, tên avdan."
Ahîn behsa Zhmetî û astengiyên ku li pêşiya wan derdikevin kir û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Em zehmetiyan di kêmbûna pisporên çandiniyê de û peydekirina mazotê ji bo bîr û makîneyên kompanyayê de dibînin."
`Emê pêwîstiya civakê pêk bînin`

Endezyar Ahîn Xelîl di dawiya axaftina xwe de da xuyakirin ku di pêşerojê de dê hewil bidin ku qada xebata xwe berfirehtir bikin, da kampaniya tevayiya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bigre nava xwe. Herwiha got, emê çandiniya herêmê pêş bixin û pêwîstiya civakê pêk bînin.

# Serhildana li Îran û Rojhilatê Kurdistanê bê navber dewam dike

**Tevî êriş û girtinan, li gelek bajarên Îran û Rojhilatê Kurdistanê duh bi şev jî xelk daketin qadan û çalakî ldarxistin. Li bajarê Selasî Bawecan yekem car xelk daketin qadan û xwepêşandan lidarxistin.**

Serhildana li Îran û Rojhilatê Kurdistanê ya ji bo azadiyê û dijî qetilkirina Jîna Emînî bê navber dewam dike. Duh hêzên Îranê êrişên xwe yên li ser xwepêşanderan tûndtir kirin û xwestin bi girtina navendên dibistanê yên li Sineyê, pêşî li xwepêşandanan bigrin.
Li bajarê Sine ku 8'ê mehê de herî kêm 4 kes hatibûn qetilkirin, duh bi şev jî li gelek taxan xwepêşandan û çalakî hatin lidarxistin. Jinên ciwan bê navber dirûşmeya 'Jin Jiyan Azadî' qêriyan û daketin kolanan.

Li bajarê Selasî Bawecan ya parêzgeha Kirmaşanê jî, yekem car duh bişev xelk daketin qadan û çalakî lidarxistin. Hêzên Îranê êrişî xwepêşanderan kirin û tê gotin welatiyê bi navê Arwîn Murîd jiyana xwe ji dest daye.
Li bajarên Bokan, Mahabad, Seqiz, Dêwlan, Kirmaşan û gelek bajarên din jî duh bişev xelk li qadan bûn. Li bajarê Bane ku rejîmê hêz lê komkiriye, duh bi şev dikandaran û kasibkaran dikanên xwe venekirin. Li ser asta Îranê jî bi taybet carek di li herêma Nazî Abadî xelk daketin qadan û çalakî lidarxistin. Li bajarên Reşit, Esfehan, Meşhed, Yasuc, Ehwaz, Zencan jî çalakiyên nerazîbûnê hatin lidarxistin.
Gorî agahiyan hêzên dewletê li nav kolan û cihên geştiyariyê de êrişî jin û ciwanan kirin, li Tahran û Meşhedê camên wesayîtên welatiyan ji aliyê polîsan ve hatin şikandin.
Hêjayî gotinê ye Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê di 8'ê mehê de bîlonçoya nû ya xwepêşandanên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê yên li dijî qetilkirina jina Kurd Jîna Emînî eşkere kir.
Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê heta niha 185 kesan jiyana xwe dane. Ji vane herî kêm temenê 19 kesan li jêr 18 saliyê de ne. Li 17 parêzgehan hatine kuştin. Lê, nîvê wan li parêzgeha Sîstan û Belûçistanê ku dikeve başûr rojhilatê Îranê hatine qetilkirin.
Li gorî ropa Federasyona Navneteweyî ya Rojnamegeran, heta niha li Îranê 21 rojnameger hatine binçavkirin.-
***ROJNEWS***





# Komploya 9'ê Cotmehê li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat şermezarkirin

**Ji bo şermezarkirina Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêber Abdulah Ocalan ku beriya 24 salan dest pê kiriye, welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê daketin qadan.**

Navenda Nûçeyan

Ji bo şermezarkirina komploya navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan, bi hezaran şêniyên Bakur û rojhilatê Sûriyê û li hemû deverên cîhanê gel daketin qadan. Welatiyên bajarê Qamişlo li Çerxerêya Sonî kom bûn û xwepêşandanek bi diruşma "Hemû şêweyên îxanet û komployan têk bibin, Rêber Apo bi fîzîkî azad bikin" li dar xist û piştre şênî ber bi Çerxerêya Şehîd Rûbar Qamişlo ve ketin rê. Xwepêşandêran wêneyên Rêber Ocalan rakirin û dirûşmên şermezarkirina komploya navneteweyî û "Bê serok jiyan nabe, bijî berxwedana Îmraliyê" berz kirin.

Herwiha bi hezaran welatiyên kantona Hesekê bi meşeke girseyê komploya navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan şermezar kir.Meş ji çerxerêya Kevokê ya taxa Miftî ber bi Navenda Çand û Hunerê ya Xabûr a heman taxê ve dest pê kir. Di meşê de diruşmeyên "Bê serok jiyan nabe" û "Bijî serok Apo" hatin berzkirin.

Bi hezaran welatiyên herêma Dêrikê bi meşeke girseyî komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan şermezar kirin.

Herwiha bi hezaran welatiyên kantonên Girê Spî û Kobanê yên herêma Firatê ji bo şermezarkirina Komploya 9'ê Cotmehê, xwepêşdanan kir. Xwepêşdanê ji Qada Jina Azad a li bajarê Kobanê dest pê kir, heta Qada Şehîd Egîd dewam
Bi hezaran şêniyên Şehba û koçberên Efrînê bi meşekê komploya navneteweyî ya 9`ê Cotmeh'ê şermezar kirin. Meş ji navçeya Ehdasê dest pê kir û li gundê Marata yê Ehdasê rawestiya.
Herwiha bi hezaran şêniyên taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyyên Helebê, bi dirûşma ji bo şermezarkirina komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Ocalan, meşeke girseyî li dar xist. Meş ji pêşiya jêrzemîna Yasîn a li rojhilatê taxa Şêxmeqsûd dest pê kir û qada Cebanat rawestiya û veguherî mitingê.

Bi hezaran welatiyên Reqayê ji pêşiya avahiya Meclisa Giştî ya Reqayê ber bi Qada Agirkujiyê ya naverasta bajar ve meşiyan. Welatî di meşê de bênavber diruşmeyên silavkirina berxwedana Rêber Abdullah Ocalan berz kirin.



Li bajarê Tebqayê jî bi sed kes li dijî komploya navneteweyî meşiyan. Meş ji taxa yekemîn "Ewel" ber bi navenda Çand û Hunerê ve dest pê kir.
Li gundewarên rojava yê Dêrazorê, bi sedan welatî û endamên saziyên sivîl û leşkerî beşdarî xwepêşandana şermezarkirina komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Ocalan bûn. Xwepêşandan ji Çerxeriya Kesre ber bi Meclisa Herêma Rojava ve bi rê ketin.

# Cemîl Bayik: PDK'ê kemîn vedabû

Navenda Nûçeyan

**Cemîl Bayik got, balafirên keşfê yên dewleta Tirk nikarin li Balîsanê gerîlaya tespît bikin lê, çekdarên PDK'ê dikare wan tespît bikin û agahiyê bidin!**

Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik di Bernameya Taybet a Stêrk Tv'yê de, derbarê bûyera Xilêfanê nirxandin kir.
Di 5'ê Îlonê de li devera Balîsanê ya Xelîfanê ya herêma Soran a girêdayî parêzgeha Hewlêrê, li dijî komek gerîlayên azadiya Kurdistanê êriş pêk hat.



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kiribû ku Êvara 5'ê Îlonê tîmek ji gerîlayên wan li dora Balîsanê bûn hedefa êrişekê. HPG'ê dabû zanîn ku li gorî agahiyên ketine destên wan de, di vê êrişê de 3 hevrêyên wan şehîd bûn, 2 hevrêyên wan jî birîndar bûn û hêzên PDK'ê ew birine. HPG'ê da xuyakirin ku divê bûyer bê lêkolînkirin û zelalkirin, her wiha hevalên wan yên ji aliyê hêzên PDK'ê ve hatine birin, bêne berdan.
Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik di Bernameya Taybet a Stêrk Tv'yê de, diyar kir ku tişta li Balîsanê hatiye kirin niha li holê ye, li ser vê bûyerê şerê psîkolojîk jî dimeşînin, ji bo ku rastî dernekeve holê gelek agahiyên şaş û derew belav dikin. Bayîk da zanîn ku li gorî agahiyên ji wan re hatine, balafirên dewleta Tirk hevalên wan bombebaran nekirine, wan ji bo hevalên wan kemîn danîbûn, êrişê hevalên me kirine û wiha dirêjî da xaftina xwe: "Du hevalên me şehîd kirin, sê hevalên ku birîndar kirin jî li gel xwe birine. Di destê me de ev agahî hene. Ji bo ku ev rastî neyê fêmkirin, dibêjin, "Balafirên dewleta Tirk bomberdûman kiriye, piştre jî ew birîndar birine". Balafirên keşfê yên dewleta Tirk nikarin li Balîsanê hevalên me tespît bikin, lê ew dikarin tespît bikin û agahiyê bidin. Ev bi destê PDK'ê û Barzaniyan rû dide. Divê gelê me bi vê yekê zanibe."

Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik diyar kir ku ew li benda daxuyaniya li ser Balîsanê ya Xelîfanê ne û divê bûyer bê zelalkirin.

# KCK'ê şehîdên 10'ê Cotmehê bibîr anî

Navenda Nûçeyan

**KCK: Emê xwedî li bîranînên hemû şehîdên şoreş û demokrasiyê derkevin û têkoşîna wan bigihînin serkeftinê.**

Di Komkujiya Enqereyê de ya ku di 10'ê Cotmeha 2015'an de rêxistinên ked û pîşeyî wê mîtîngeke aştiyê li dar bixistina, lê li dijî wan bi destê çeteyên DAÎŞ'ê êrîşeke bombeyî hatibû kirin û di vê êrîşê de 103 kesan jiyana xwe ji dest dabûn.
Derbarê salvegera komkujiya Enqera yê, Hevserokatiya Konseya Rêvebir ya KCK daxuyaniyeke



nivîskî da.
KCK'ê di daxuyaniya xwe de komkujiya Enqera yê şermezar kir û wiha got: "Em vê qetlîama herî giran û mezin a dîroka Tirkiyeyê de bi nefret şermezar dikin û kesên ev qetlîam kirine jî nalet dikin. Di şexsê kesên ku bi hestên bihevrejiyana gelê Kurd û Tirk tevlî mîtîngê bûne, hemû şehîdên azadî û demokrasiyê bi rêz û hurmet bi bîr tînin."

KCK'ê da xuyakirin ku kumkujiya Gara Enqereyê di dîroka Tirkiyeyê yek ji komkujiyên herî mezin a siyasî ye û wiha domand: "Kujerê vê qetlîamê jî tifaqa AKP û MHP'ê ya faşîst e. Tifaqa faşîst a AKP û MHP'ê, bi destê DAÎŞ'ê ev qetlîam çêkiriye. Wekî ku bi vê qetlîamê hatiye fêmkirin, AKP û MHP'ê di êrîşan de DAÎŞ'ê dixin dewrê. Berê jî qirkirina Kurdan bi destê Hîzbî-Kontra dihate kirin û niha jî AKP û MHP di qetlîaman de DAÎŞ'ê dixe dewrê."

KCK'ê da zanîn ku Rêber Apo ji bo têkoşîna hevpar û tifaqa demokratîk ya gelê Kurd û gelên Tirkiyeyê kedeke mezin da û ji bo vê çarçoveyek bîrdozî û teorîk ava kir. KCK'ê wiha dewam kir: "Rêber Apo di tevahiya jiyana xwe de ji bo gelê Kurd û gelên Tirkiyeyê bi zanista neteweya demokratîk bi hev re bijîn û ji bo pêkhatina tifaqa demokratîk û avakirina Tirkiyeyê di nava xebateke girîng de bû. Ji ber vê xebat û helwestê, desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê tecrîd û pergala êşkenceyê ya giran li ser Rêber Apo ava kiriye."
KCK'ê diyar kir ku ew bi hemû hêz û hebûna xwe bi gelên Tirkiyeyê, jin, ciwan, kedkar û yên xwedî kevneşopiya baweriya demokratîk re ne û daxuyaniya xwe wiha qedand: "Em careke din di şexsê şehîdên 10'ê Cotmehê de hemû şehîdên şoreş û demokrasiyê bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin û diyar dikin ku em ê xwedî li bîranînên wan derkevin û têkoşîna wan bigihînin serkeftinê."

# Kalkan: PKK hêza çareseriyê ye

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Dûran Kalkan got, PKK li hemberî neçareseriya sîstema modernîteya kapîtalîst, bi xeta Neteweya Demokratîk xwe kiriye hêza çareseriyê.

**Navenda Nûçeyan**



Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Dûran Kalkan bi wesîleya salvegera Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku di 9'ê Cotmeha 1998'an de hate destpêkirin, ji ajansa ANF'ê re axivî. Dûran Kalkan diyar kir ku hêzên qirkirina Kurdan birêve dibin, bi gelê Kurd û bi tekoşîna wê ya azadiyê re di nava şer de ne û wiha domand: "Di navbera wan hêzan ku dixwazin gelê kurd di qirkirênê de derbaz bikin de jî, şer û pevçûn heye. DYA bi Ingilîstan û Îsraîlê re, bi xwe spartina NATO' yê ve hemû dewlet û rêxistinên ku di bin bandora wî de, di êrîşa Komploya Navnetewî ya li hember Rêber Apo de bikar anîn. Bi vî awayî xwestin Rêber Apo tune bikin û PKK'ê jî tasfiye bikin. "

Dûran Kalkan da xuyakirin ku herî dawî dema Îranê çend top avêtin axên Başûrê Kurdistanê, Iraqê di serî de Rêveberiya Başûrê Kurdistanê jî di nav de, hemû kesî dewleta Îranê şermezar kir û wiha got: "Dewleta Tirk qadên herî stratejîk ên Başûrê Kurdistanê, qadek ji sedan kîlometreyan pêktê yên xakên Iraqê dagir kiriye, tu kes nabêje tu çima wiha dikî, her kes veşartî an jî vekirî piştevanî dide. Dagirkerî ji Tirkiyeyê re serbest e. Helbet tenê serbest jî nakin. Her cûre çek, piştevanî jî didinê. Herî dawî çekên herî pêşketî, teknîka herî pêşketî dan wî. Di vê astê de piştevanî, yekitî- yekparetiyek heye. Li ser vê bingehê pergala 24 sal beriya niha, ji bo tunekirina Rêber Apo û tasfiyeya PKK'ê di êrîşa Komploya Navnetewî de hat destpê kirin, didome."

Dûran Kalkan da zanîn ku Rêber Apo jin weke bingeh û hîmê hemû azadiyên civakî nirxand û wiha got: "Rêber Apo li hemberî xwezayê hişmendiya ekolojîk û nêzîkatiya ekolojîk esas girt. Li hemberî nêzîkatiyên hilweşîner û wêranker yên her cure nêzîkatiyên endûstriyalîzmê, sîstemeke ku pêşbîniya aheng û yekparçebûna xweza û civakê dike, pênase kir û pêşkêşî civakan kir. Bi kurtasî, PKK'ê guhertin û veguhertineke radîkal jiyan kir. Rastiya Rêbertiyê di pêvajoya 2002-2004'an de ev guhertin jiyan kir. Ev guhertin û veguhertin li tevahiya partiyê belav bû, li gel pirtûka Parastina Gelekî û bi Manîfestoya Civaka Demokratîk, pêş ket. Ji îdeolojiya Netewe-Dewletê û ji paradîgmaya desthilatdarî û dewletê qut bû. Veguherî partiyeke nû, ku paradîgmaya civaka ekolojîk, demokratîk û azadîxwaziya jinê û civaka demokratîk, xweparastin û siyaseta demokratîk esas digire."

Dûran Kalkan diyar kir ku têkoşîna li dijî Komploya Navneteweyî di astekê jor de bû û wiha got: "Di Çileya 2000'an de encamek derket holê, Sîstema TC'yê îlan kir ku înfaza cezayê darvekirinê ya li Îmraliyê hatiye dayîn daye rawestandin. Li aliyê din PKK'ê bi Kongreya 7'an re ragihand ku bi rawestandina Stratejiya Şerê Gel re guhertineke stratejîk pêk aniye û li dijî kompoloya navneteweyî wê bi stratejiya têkoşîna siyasî ya demokratîk tevbigerin. Li gorî vê yekê, karê xwe bi xwe plan kir. Xwe bi rêxistin kir."

Dûran Kalkan da zanîn ku niha di têkoşîna li dijî kompoloyê de veguhertineke stratejîk pêk hatiye û axaftina xwe wiha domand: "Di sala 2000'an de stratejiya têkoşîna siyasî ya demokratîk esas hat girtin û qonaxa sêyemîn a stratejîk destpê kir. Di sala 2010'an de qonaxa sêyemîn a stratejîk bi dawî bû û qonaxa çaremîn a stratejîk hat destpêkirin, Stratejiya Şerê Gel ê Şoreşgerî esas hat girtin û li ser vê bingehê hewl hat dayîn ku şêwaz û taktîkên têkoşînê bên pêşxistin." Dewran Kalkan diyar kir ku ji bo 'Kurdekî Azad' hebûna xwe ispat bike, qutbûna ji pergala Modernîteya Kapîtalîst a hegemonîk ya ku pergala qirkirina Kurdan afirandiye, pêvîst dike û wiha got: "Îdiaya ku ez ê bêyî ku ji pergala modernîteya kapîtalîst qut bibim, ez ê bibim Kurdekî azad, weke îddîayeke vala, ramanek bêbingeh, xwe xapandin û xeyalek e. Gelek hêzan ev şaşîtî kirin. Armanca wan ew bû ku ji bo ferdperestiya xwe ya burjûwaziya biçûk jiyan bikin, hawîrdora maddî ava bikin. Lewma nexwestin zêde xwe bigihînin cewhera piskirikê. Ji ber ku cewhera meselê bi vî awayî didîtin, berê xwe didan revê û qutbûna ji wê derê."

Dewran Kalkan bal kişand ser lêgerîn û lêhûrbûna Rêber Apo û wiha got: "Lêgerîn û lêhûrbûna Rêber Apo, ew ber bi veguhertina paradîgmayê, xeta Neteweya Demokratîk û projeya konfederalîzma demokratîk a li ser bingeha xweseriya demokratîk ve bir. Zihniyet û îdeolojiyek nedesthilatparêz û ne dewletparêz afirand. Sosyalîzm û demokrasî, ji yekdestdariya dewlet û desthilatdariyê rizgar kir, di nava xwe de kir yek û sosyalîzma demokratîk pênase kir. Neteweya demokratîk weke projeya wê ya civakî pênase kir. Xweseriya demokratîk û Konfederalîzma Demokratîk weke projeya xwe ya siyasî pênase kir û ev hemû spartin azadiya jinê û ekolojiya civakî."

## Komplo û Komplo ger



Farûk SAKIK

Her sal di salvegera Kompoloya Navneteweyî de behsa heman tiştan tê kirin û kronolojiya rojên Rêber Apo yên li Ewropa heta Kenyayê tên rêzkirin. Rola dewletan a di kompoloyê de tê bibîrxistin. Bi meş û mitîngan komplo tê şermezarkirin. Piştî kompoloyê behsa têkoşîna hatî dayin tê kirin. Lê em ê ji van aliyan cuda behsa aliyek din ê kompoloyê bikin.

Min di nivîsa xwe ya berê li ser 'pêşdîtinên Rêber Ocalan' nivisî bû. Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan li ser bûyerên îro diqewimin wê bandoreke çawa li ser pêşerojê bike, baş analîz dikir û li gorî wî jî tevdigeriya. Lê di pêvajoya kompoloyê de çibû, çi qewimî li ku dîl ket destê komplogeran û radestî Tirkiyê hat kirin. Li vê derê li pêşiya pêşdîtinên Rêber Ocalan çi astengî hebûn? Ev yek hetanî roja me baş nehat lêkolînkirin.

Rêber Apo siyaseta Rojhilata Navîn baş analîz kiribû û bawerî anîbû ku bimîne, wê doza Kurdistanê û Rojhilata Navîn zarar bibîne.

Derket û derbasî Yûnanistanê bû. Li Yûnanistanê ji bo wî amadekariyeke çawa hebû, nizanibû û bi hin kesan bawerî anîbû. Dema Rêber Ocalan derbasî Yûnanistanê bû, dît ku rewşeke cuda heye. Dît tu tiştek li gorî tiştên ku bi wî re hatine parvekirin nameşe. Hin tişt ji wî hatine veşartin. Lê êdî dereng bû. Li ser vê yekê ew derbasî Rûsyayê bû.

Li Rûsyayê hin kesan sozên mezin dan Rêber Apo. Gotin; 'Meclisa Dumayê ji bo serdana te ya penaberiyê hatiye îknakirin'. Dîsa bawerî anî û di pişt perdeyan de çi hat axaftin nehat zanîn. Her çiqas Ocalan ji wan re behsa bazirganiya navbera Rûsya û Tirkiyê ya projeya 'Mavî Akim' kir jî, lê wan bi israr Rêber Ocalan manupule kir. Ew li wir jî derket û derbasî Îtalya-Romayê bû. Rêberê gelê kurd Abdullah Ocelan li Romayê jî, dîsa bi pêşdîtinên xwe bahsa NATO, zextên Amerîka û helwesta Almanyayê yek bi yek kir, lê dîsa jî hin kes û hin alî bi awayekî derveyî îradeya wî, di dewrê de bûn. Xwestin Rêber Apo ji Romayê derkeve. Îstîxbaratên Ewropî di dewrê de bûn û hin kes hatibûn rêxistinkirin da ku Ocalan îkna bikin û wisa jî bû. Ew ji Romayê derket û pêvajoya Kenyayê dest pê kir.

Hêdî hêdî ji rêxistinê û ji gel dihat qûtkirin. Rêber Apo bi wan pêşdîtinên xwe nikaribû komplogeran ji armanca wan wegerîne.

Li Kenyayê bû. Kêlî bi kêlî têkoşînek dida û bi tenê bû. Eger pêşdîtinên wî nebane dibû ku, di demê 2'yê sibatê de derbasî Kenyayê bûyî, ewroj radestî Tirkiyê bihata kirin. Lê li Kenyayê jî dîsa hêzek û hin kes di dewrê de bûn. Israra Ocalan a ji avahiyê derneketinê bi telefonek bi dawî bû. Dema ji avahiyê derket, perdeya kompoloyê ya yekem bi dawî bûbû.

Li Yunanistan, Rûsya, Roma û Kenyayê hêz û kesayetên di dewrê de bûn, li pêşiya pêşdîtinên Rêber Apo dibûn asteng?

# Rêxistina Mafê Mirovan: Ji serê salê ve 428 kes li Îranê hatine darvekirin

**Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê di roja parastina cezayê darvekirinê de ragihand ku di destpêka sala 2022'yan heta niha li Îranê rêjeya kesên hatine darvekirin, li gorî sala borî sedan 89 zêde kiriye û hat eşkerekirin: "Di nava vê demê de 2 zarok û 12 jin cezayê darvekirinê lêhatine birîn."**

Di roja cîhanî ya têkoşîna li dijî cezayê darvekirinê de, Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê bi daxuyaniyekê bilançoya 10 mehên borî ya kesên li Îranê hatine darvekirin eşkere kir. Li gorî daxuyaniyê rêjeya îsal li gorî sala borî jimara kesên ku hatine darvekirin, sedan 89 zêde kiriye. Di dewama daxuyaniyê de wiha hat ragihandin: "Jimara darvekirina girtiyan li bajarên Îranê di rêjeyek zêde de bilind bûye. Li gorî bîlançoyên ku hatîn bi destxistin ji destpêka sala 2022'yan ve herî kêm 428 kes ku 2 jê zarok û 12 jê jin bûn ji girtîgehên Îranê li ber çavê xelkê hatine darvekirin. Çavkaniyek fermî û medyaya navxweyî ya Îranê di nava vê demê de tenê sêdaredana 52 kesan ragihandiye. 376 kesên din jî ji çavkaniyên herêmî yên pê bawer û parêzvanên Mafên Mirovan, rêxistina me bilançoyan de qeyd kirine."

Rêxistinê da zanîn ku hejmara kesên ji serê sala 2022'yan ve hatine darvekirin, li gorî sala borî bi qasî sedî



89 zêde bûye. Sala borî 226 kes hatibûn darvekirin.

Hejmara kesên Beluç ku ji serê salê ve hatine darvekirin, bi awayek berçav zêde bûye. Tê gotin 121 kes di nava van deh mehane de hatine darvekirin, yanî ji sedî 35'ê vê hejmarê Beluç bûn. Îran yek ji wan welatane ku cezayê darvekirinê li ser zarokanên temenê wan dibin 18 salî de pêktîneye. L gorî daneyên Rêxistina Mafê Mirovan ji serê sala 2022'yan ve herî kêm 2 zarok ji aliyê Îranê ve hatin darvekirin.

Li gorî daneyên Rêxistina Mafê Mirovan ya Îranê di 10 mehên sala 2022'an de 12 jin li girtîgehên cûda yên Îranê hatine darvekirin. 11 ji wan bi sucê kuştinên bi qest cezayê darvekirinê li wan hat birîn û yek jî bi sucê peywendiya wê bi madeyên hişber re hebû, hate darvekirin.

Di sala 2002'yan de Hevpeymana Cîhanî ya Dijî Cezayê Darvekirinê, roja 10'ê Cotmehê weke roja cîhanî ya têkoşîna dijî cezayê darvekirinê destnîşankir.

***ROJnews***



# `Armanca komplo bi têkoşînê têk diçe`

Gulîstan Oso kompoloya 9'ê Cotmehê ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û diyar kir ku, komplo ne li ser Rêber Ocelan tenê ye, li dijî tevahî gelê Kurd e. Herwiha bang li gelê herêmê bi taybetî gelê Kurd kir ku, dijî kompoloyê, têkoşîna xwe xurttir bikin û ji bo azaiya Rêber Ocalan li ser piya bin.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Komployek Navneteweyî hate destpêkirin. Roja 9'ê Cotmehê 24 sal li ser kompoloyê re derbas dibin. Herwiha dewleta tirk ya dagîrker, niha jî li ser Rêber Abdullah Ocalan tecrîdeke giran dimeşîne.

**`Ti hêz nikare gel ji Rêber Apo qut bike`**

Hevseroka Bîroya Karûbarê Koçbera ya Herêma Cizîrê Gulîsatan Oso, Kompoloya 9'ê Cotmehê şermezar kir û diyar kir ku, êrişên dewleta tirk ya dagîrker û hevalbendên wê, yên li dijî gelê herêmê, berdewamiya komplo ye.

Gulîsatan axaftina xwe wiha domand: "ji bo hêzên seredest, azadî û demokrasiya gel ne girîng e. Lewra ew dixwazin civak her tim koleyê wan be. Li dijî vê desthildariyê û ji bo jiyaneke azad û bi rûmet,





Rêber Apo dest bi têkoşînê kir û bi fikir û felsefeya xwe ya azad, bandorek erênê li gel kir. Kompoloya Navneteweyî bi armanca qutkirina gel ji Rêbertiyê û şkandina vîna gel bû. Lê armanca dewletan ya ji komplo pêk nehat û ti carî jî pêk neyê."

Gulîstan got, dewleta tirk ya dagîrker û hevkarên wê baş dizanin ku pirojeya aşîtiyê bi azadiya Rêber Apo ye. Herwiha Gulîstan diyar kir ku ew, tecrîda giran ya li ser Rêber Apo tê meşandin qebul nakin. Gulîstan bang li cîhanê kir ku, çav û guhê xwe li ser binpêkirinên dewleta tirk ya li dijî gelê hermê, veke.

**`Herkesê xwedî wijdan û ehleq divê li keda Rêber Apo û şehîdan xwedî derkeve'**

Gulîstan Oso destnîşan kir ku, dewleta tirk ya dagîrker bi êrişên xwe yê hov, dixwaze vîna gel û aramiya herêmê têk bibe. Lewra ew baş dizane ku projeya neteweya demokratîk, azadiya tevayîya gelê herêmê ye. Golîstan wiha domand: "Em hîvîdarin ku di demek kurt de, ev komplo û tecrîd li ser Rêberê me rabe û Rêberê me azad bibe, lewra cihê kesayetek wek Rêbertiyê, ne zindan e. Dewleta tirk bi dagîrkirina bajarê me bi êrişên xwe yê hov li ser Herêmên Parastina Medyayê, bi şehîdxistina keç û xurtên me, dixwaze me ji ramanên Rêber Apo dûr bixe. Lê



bila tevayîya cîhan baş bizane ku çi dibe bila bibe emê li ser şopa şehîdên xwe bin û li ser vê sozê neyên xarê."

Herî dawî Hevseroka Bîroya Karûbarê Koçbera ya Herêma Cizîrê Gulîsatan Oso bang li gel kir û got, pêwîste hemû gel, hemû pêkhateyên ku dibêjin em xwedî wijdanin, bibine yek. Ji bo welatek azad, ji bo xwedîderketina li xwîna şehîdan û keda Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li ber xwe bidin û têkoşîna xwe hîn bêtir xurttir bikin.

## Rêya çareserîyê mayînde demokrasî ye



Zekî BEDRAN

Erdogan ê faşist, li ser Sûrî leystok û kompoloyên xwe didomîne. Ji ber ku li Tirkiyê hilbijartin nêzîk bûye, hewldanên xwe bi lez xistîne. Ji bo êrîşê bakur û rojhilatê Sûrî bike û çend herêmên din dagir bike, xwe hildavêje. Êrîşên wî yê başûrê Kurdîstanê ji ber ku li berxwedana gerîla qelibî, encamê ku dixwast nekarî bigre. Bi hezaran leşkerên wî mirine lê, dîsa jî nasekine. Dixwaze bi çîrokekê serkeftina leşkerî, biçe hilbijartinan. Dizane ku di rewşê asayîde nikare bê hilbijartin.

Civîna Tahran`ê de û peyre jî, bazarê ku bi Putîn re li Suçî kiribûn bi temamî negîhîşt encamê. Putin gotiye, 'here bi Esed re hevdîtin bike û di navbera xwe de Kurdan çareser bikin.'' Putin, ji bo Erdogan careke din bê hilbijartin, wê piştgirî bide. Ji bo vê dikare qenciyek li Erdogan bike û ji dagirkirina hinek herêman çavê xwe bigre. Erdogan û Putin di asta herî jor de, berjewendîperest tevdigerin. Erdogan ji bo rêveberiyê İsrail, Suudi û îmarat, tişta hat ber devê wî got, lê dema tengav bû cardin çû ber lingê wan û destê wan maç kir. Ji bo şexsiyetên faşist tiştên wek sinc, pîvan û dad nînin.

Rusya, dixwaze bi rêya Erdogan re NATO û DYA mijûl bike. Her wiha ji bo ambargoya li ser xwe jî bişkîne, Erdogan bikar tîne. Şerê Rusya yê li dijî Ukrayna jî wek dixwast nemeşiya. Hat dîtin ku hesabên xwe pir şaş kirîne. Armancê Rusya ew bu, ku Ukrayna bikşîne ser xetê, nehêle têkeve NATO`yê û hişyariyek bide ewropa. Lê nekarî pêşiya têketina Ukranyayê ya NATO'ê bigre. Di ser de jî Swêd û Fînlandiya serlêdana tevlîbûna NATO`yê kirin.

Erdogan, tengaviyên Rusya baş bikartîne. Ji ber şerê hember Kurdan û diziyên wan, aboriya Tirkiyê îflas kiriye. Ji rojava û ji dewletên ereban pereyê germ nayê. Ji ber vê dixwaze ji Rusyayê sûd bigre. Her wiha Rusya û hêzên din jî dijminahiya wî ya bê sînor ya li hember kurdan, ji bo berjewendiyên xwe bikartînin. Zaafê Tirkiyê û Erdogan jî Kurdin. Ji bo Kurdan amadeye ku her tawîzê bide û Tirkiyê bixe bazarê.

Erdogan xwast Kurdan bipelçiqîne, projeya qirkirinê bigîhîne encam û xwe bike Atatirk'ê dûyem. Lê niha, li hûndir û derve sipartekê wî lawaz bûne. Kurd dijwar derketin. Hûndir û derve hemû çavkaniyên xwe, îttîfaqên xwe bikaranîn, dîsa jî encamê ku dixwast negîhîştê. Ji ber vê desthilatdariyê wî û qedera wî bi vê şerî ve hate girêdan. Ji bo vê xwe bi lingê Putîn pêçandiye. Erdogan, domandina hilweşandina ku li Sûrî`de kiriye şaş nabîne. Fikirandinek mirovî û wicdanî cem wî nîne. Hemû cîhan dibêje li Sûrî şer bese, edî pêwîste çareseriyek siyasî bê dîtin. Erdogan hemû cîhanê digere û dibêje, `min negrin, min berdin ez êrîş bikim.` Tam sekneke serserî nîşan dide. Lê serserîtî û qabadayêbûnê wî girêdayî îcaze dayîna DYA û Rusya ye. Ji ber ev hêzên mezin bi xwe jî li Sûrî ne. rûxmî van hêzên mezin Erdogan nikare êrîş bike. Mafê bikar anîna esmanî ji Tirkan re bê girtin nikarin şerê bejahî bigrin ber çav. Heta niha komkujiyên ku bi teyareyên bê mirov ya bi çek kirîye, van hêzên mezin yên li Sûrî îcaze dan. Bi şêwazeke li hev kirin. Tirkiyê li bejahî jî her tim êrîşên xwe yên bi topan didomîne. Artêşa Sûri hatiye li ser sînor, Rusya di nav mijarêde ye. Lê tenê temaşe dikin. Ev helwestê wan derfet dide ku Erdogan di meydanê de bigere. Gel bi meraq temaşe dike, ka rêveberiya Şamê wê çi bike. Li gor rewşa heyî divê bi dawîkirina dagirkerî bê taleb kirin. Hem tûyê bi deh hezaran leşkerê xwe li Sûrî bi cîh bikî, hem jî bi deh hezaran çeteyên çekdar bi navê SMO rêxistin bikî û piştre jî bejî were em hevdîtin bikin. Ev yek dibe ku bê hesabê Putîn. Lê Sûrî, wekî ku tiştek nebûye ji dewleta dagirker ya Tirkiyê re ku welatê wan hilweşandiye, nikarin bêjin 'temam were em hevdîtin bikin'. Herwiha tê zanîn ku şertê Erdogan ji bo hevdîtinan, derxistina şerekî nû li Sûrî`ye. Herwiha hemwelatiyên Sûrî, Ereb û Kurdan li hember hev bide şerkirin û dibêje, 'divê hûn jî tevlî projeya min ya qirkirina Kurdan bibin'.

Rêveberiya Şam`ê ne amadeye ku ji bo Sûrî`yeke demokratîk gav bavêje. Ji ber wê nikare polîtîkayeke zelal jî bimeşîne. Gelên Sûrî berdêlên mezin dane. Ji ber vê divê gel jî tevlî çareserîyê bê kirin. Çareserî dive, bi gel re bê nîqaşkirin û xwastekê wan divê cîddî bên girtin. Lê rêveberî li ser elimandinên berê dimeşe. Hevdîtinên navbera dewletan û sirriyetek mezin esas tê girtin. Di dawîde gel wê bi encamekê ji nişkêve derketî re, rûbirû bimîne. Bendewariyek ku hikûmeta Şamê ji elimandinên xwe vegere ne gengaze. Ji ber wê divê hêzên demokrasiyê dixwazin, tevlî pêvajoyê bibin. Cûwan, Jin, Rewşenbîr û Kedkar li mala hevbeş Sûrî de, divê hember leystokên bi xuyîn, bibin yek. Zelale k utu dewlet ji bo Suriyekê demaokran tiştekê nake. Derdê wan tinê parastina berjewendî û desthilata xwe ye. Lê êdî pêwîstiyê Rojhilata Navîn bi nefes girtinê, azadî û demokrasiyê heye.